Ji Amedê
DAYÎKEK DILBIRÎN
Helbestvan û Wênekêş

BÎLGE ACAR

Bîlge Acar û malbeta wê jî wek pir malbetên Kurd di dawiya sedsala bîstan de li welatê xwe yê şîrîn derketine dervayî welat. Li bakurê welat guhartina herî mezin ya cara yekem şoreşa netewî ya Kurdistanê bi zirûfek şoreşgerî di destpêka salên 1970 yî de rabû serpêyan. Lê neyaran ew zû dîtin û li gor wê jî, planên xwe yên ji Osmaniyan wergirtin carek din li ser Kurdan bi kar anîn. Di van salên dawî de bi hezaran şervanên azadiyê û têkoşerên aşitiyê hatin kuştin. Bi hezaran gunden Kurdan hatin şewitandin û bi milyonan Kurd ji erda bav û kalên xwe hatin derxistin û dûrxistin. Ji wana hin çûn metropolên Tirkan û hin jî bûn koçberên cîhan!

Kela Amedê *

Şaredariya Amedê *

Bilge Acar ji malbetek Kurd welatparêz hatiye dinê. Ew ji Gundê Duderiyê, ya ku nêzîkî qeza Qulpê û bi Amedê ve hatî girêdayî ye. Malbeta wê hîn ew nehatî bû dinê, di sala 1938 an de wana sirgûnî rojavayê Anatolyê bajarê Aydinê dikin. Ew li sirgûnê hatiye dinê. Di sala 1950 î de malbeta wan ji sirgûnê dîsa vedigerin Amedê. Ew dibistana seretayî, navîn û lisê li Amedê diqedîne. Paşê qasî salekê li bajarê Qulpê mamostetiyê dike. Di sala 1964 an de bi rêzdar parêzer Ziya Acar ve dizewice û diçe paytextê Tirkiyê Enqerê. Heya sala 1979 an ewna vegerin Amedê, ew malbeta li Enqerê dimînin.

Çemê Dîclê û dîmenek ji quncê baxçeyên Hevsel *

Ew li Enqerê jî, di karê memurtiyê de xebitiye û di aliyê din de, wê li vir wênekêşiya xwe ya ku di dibistana navîn de destpekirî pêş de birye. Çi di destpêkê

de û çi dema Enqerê bû, wêneyên wê çêdikirî ji aliyê wênenasan ve bi behreya raserîn dihatin pejirandin. Ji bo vê ye, ku Civata Wênekêşên Enqerê biryar girtî bûn, wê ji bo hunera xwe pêş de bibe, jê re bursa dewletê derxînin û wê bişînin Akademiya Hunerên Qenc ya Parîsê. Çi mixabin wê, ew derfetên bi dest ketin di aliyê civakî ya Kurdistanê de, ji bo ku bandora neyînî ya li ser jinên Kurd heyî bi tesîra wan, wê ew firsata nikarî bû bi kar bîne!.. Di jiyana wê de, ew firseta pêkneanî, ew her wek kêmasiyekê mayiye!

Gelek salan şunda dema Bîlge Acar ew firseta dît, wê wênekêşiya xwe ya di ciyê mayî de hîßtî berdewam kir û îmzeya xwe avêtiye pêşangehên mezin. Li bajarên wek Koln û Parîsê wê pêşangeha xwe ya wêneyan pêşkêş gelhe kirye. Di van rojan de di Çiriya Paşin ya sala 2008 an de ***„Pêşangeha Wêneya Guruba Jinên Hevwelatiyên Tirkiyê (Multi Couleurs, Artistes parisiennes aux mille et une cultures d'Anatolie) li Parîsê“ vebû. Di vê „Pêşengeha Wêneya Guruba Jinên Hevwalatiyên Tirkiyê Li Parîsê“*** de Dayîya Azad (Bîlge Acar) jî di nav beşdarên pêşangehê de ciyê xwe girtiye.

Di nav milyonek zêdetir Kurdên hatî Ewrûpeyê de malbeta Acar'an cara pêşî destpêka sala 1983 an de hatin Elmanyê û paşê jî derbasî Parîsê bûn. Heya roja îro ew malbeta Kurd li Parîsê dijîn. Hem li welat û hem jî li dervayî welat, wana di nav têkoşîna netewî ya Kurdistanê de ciyê xwe bi malbetî girtine û ji bo vê jî gelek bedel dayine.

Di sala Tabaxa 1990 î de malbet bi lawkê xwe yê navê Azad ve dema diçin vehesîna havînê ya li Îspanyayê, Azad li pêş çavên wan di behra mezin ya reş de dixeniqe!. Ew bûyer rih û jiyana dayîkê tarî dike û wê dike nav şîn û şewata xemgîn. Ew dayîka dilbirîn şêv û roj dilorîne û paşê jî ew gotinên xwe yên bi şewat li ser kaxizên spî direşîne! Hêdî ew xemgîne, ji bo Azadê xwe dilorîne û ew dibe „Lorînbêj“ek Kurdistanê. Di gotarak wusa de ez naxwazim piraliya wê ya hunerê bikolînim. Lê merc hene ku aliyê wê yê helbestvanî pêşanî bidim.

Bilge Acar çawa hunera wê ya wêneyan salên wê yên ciwaniyê de destpêkirye, ez bawerim di wan salan de hêlbestvaniya wê jî destpekirye. Lê ew li ser helbestvaniya xwe ji bo wan salan tiştek nabêje. Bes şewata dilê wê, bi bûyera Azad aliyê wê yê helbestvanî derxistiye holê!.. Li ser vê bûyerê ji naveroka „Lorîbêjî“ yên xwe wê di sala 1993 an de li Parîsê helbestên xwe bi navê „Xortê Min jî Yek Ji Wan“ diweşîne. Paşê lorîbêjiyên xwe bi rewşa welat ya dijwar û necar ve girê dide û bi navê „Xwezil Hemû Xewn Bûna“ pirtûka xwe ya helbestan duwemîn di Gulana sala 2002 an de diweşîne. Hin caran di helbestên xwe de li ciyê navê xwe, naznava „mahlas“ Dayîka Azad“ jî bi kar tîne.

Ew her çiqas di destpêka pirtûka xwe ya helbestan yekemîn de dibêje:

„Ez ne şair im, ez ne hozan,
Ez ne xwediyê ew dew, dozan!
Ez hemal im, barê xwe xem,
Menzîl ber bi dil bi kulan!..“

Lê ne wek ew dibêje „Ez ne xwediyê ew dew, dozan!“ im. Di pirtûka xwe ya helbestan de hozana hêja xwediyê dew û dozên xwe ye jî!.. Ew derd û kulên dilê xwe yê brîn di helbestên xwe de bi hostetiyek mezin helbestên xwe hûnandine û nivîsîne. Ew bi „Lawij“ û „Lorîbêjên“ xwe gîhîştiye qonaxek herî bilind. Bi van hunerên xwe, ew di nav hosteyên vê mijara wêje û helbesvaniyê ye. Di helbestên wê yên dirêj wek helbesta „Çemê Hêsiran“ de mirov rastî temaya destanên mezin tê. Helbest bi serê xwe wek pirtûkek destanek ji sê beşan pêk hatiye û ew qasî 70

pelî ye. Di naveroka helbestên wê de, bes ne mijarên kesayetî yên xwe şexsî tenê, mijarên civakî û nîştîmanî jî hene.
Mînak:

Çemê hêsiran bila nebê,
Min ji we xwest, lê we neda!
Kesk kulîlkên sor û zer,
Sazkirin ala rengîn
Sefer bûn, rûbar hevda,
Wê pêl bidin ala Kurda!..

Di pirtûka wê ya yekem de hin kêmasiyên rêzimanî (gramatîk) hebin jî, di pirtûka duwemîn de mirov wan kêmasiyan nabîne. Lê li ciyê kêmasiya pirtûka yekem de heyî, di pirtûka duwemîn de mîzanpaja wê de şaşitiyên ji aliyê çapxanê ve hatin çêkirin, wana dilê helbestvanê xuya ye, ku êşandine!.. Lê du heb pirtûkên wê yên di destê xwendvanan de heyî, naveroka wan bi ßewat be jî, ji aliyê xwendevanan ve bi kêfa wan têne xwendin.
Helbestvan di pirtûka xwe ya helbestan duwemîn „Xwezil Hemû Xewn Bûna“ de, ew dîsa bi helbesta xwe ya dirêj bi navê „Xewn û Mîtal“ destpêdike. Helbest bi çarînan (çarrêz, kit'a) hatiye nivîsandin. Her çar rêz di nav xwe de hatine kafiyê kirin. Di helbestên wusa dirêj de bi kafiyên wusa nivîsandin, jê re bê guman hostetiyek mezin pêwîst e. Helbestvana hêja di derheqê va hostetiya xwe de baß derketiye.
Di naveroka helbestên Bîlge Acar de, wê rewşa jinên Kurd aniye ber çavên xwe û derd û kulên wan jî bi hostatiya helbestvaniya xwe hunandiye. Bi navê „tore“ kuştina jinên Kurd ew li dijî derdikeve û dixwaze jinên Kurd jî wek jinên welatên rojava serbest û azad bijîn.
Ew li ser vê mijarê di helbestek xwe de dibêje:

.....
Ji dayikên xwe em dixwazin
Klamek bêjin me ra,
„Jin hebe heke tê de
Dîl nebe, hêsîr nebe!..
Mirovatiya wê dilêşîn
Ser xwe ra meqam nebe,
Bîhn û stûyê wê dikşîn,
dişidîn nêr gem nebe!..

Wekhevî nav cinsan da
Li ser ziman xeml nebe,
Dirustî be bes tê de
Dirûtî bi şeml nebe!...
.....

Di aliyê din de bi „lorîbêjî“ dema rewşa welat ya bi şewat ber çavan bêye rêxistin, wê demê li ser rih û hestên welatparêzan, helbestvan tesîrek mezin pêk tîne. Dema bi hostetî helbestvan vê di helbesta xwe de kar bîne, ew erka li ser milên xwe ya

hozantî cih tîne. Ew jî, ji bo hozanvanan merhaleyek herî berz e! Ez di wê baweriyê de me, ku helbestvan heke nivîsandina xwe ya helbestan wusa berdewam ke, yê di dîwana xwe ya helbestan sêyem de bigîhîje mertebeyek nû.
Her çiqas ez nexwazim jî, ew bûyera borî dîsa carek din bi bîra helbestvanê bînim jî, lê dîsa dixwazim bi gotin û hestên wê yên germ dawî bi nivîsandina xwe bînim.
Helbestvan, helbesta xwe ya bi navê „ Ax De Lawo!“ de hestên xwe yên xemgîniyê wusa tîne ziman:

„Dudo xwuşk in, yek jî bira,
Li dor te bûne qor û sira!
Ji wan diqetî ku da diçî?
Bi vê kula bêçar giran!

Bêjin ku ji te ra „keko, bira
Vemeşêre beş awira!
Me b'çûna xwe meyûs meke,
Meyne kêfa mizawira!“

Nay lawo li dilê şêra,
Evê xewa jan ev pê ra.
Mêr egîdan ku heşyar nake
Dibe siya sextemêran!..
.....
ji destê lawo kul-kesira,
Li hev dixim da nirx û nîra.
Ew li ser te jî ez nerêjim,
Çito bikim bi van hêsira?..
.....
Bi kêmasî û nîn be bira,
Ax de lawo were vira!..
Emrê xwe mayî li we par kim,
Bighîn hev hûn xwîşk û bira...
.....
Ax de lawo were vira,
Bes heliyam, bûm ew çira!
Bê rûn, fitîl tariya xwe da
Çira jî digrî bi giriyê min ra!..“

A. BALÎ
Wêjevan-Lêkolînêr
06.12.2008

* Wêne ji arşîva a.balî hatine girtin.